Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :883 25-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165



Bersiva jimara borî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	R	■	L	A	M	■	K	Î	N
2	O	T	O	R	Î	T	E	■	A
3	J	Î	■	D	■	A	R	A	V
4	■	R	A	■	A	L	Î	■	M
5	A	■	B	E	J	Î	■	N	A
6	L	A	■	H	O	■	P	Û	L
7	A	D	A	R	■	T	E	■	Î
8	■	I	■	A	B	O	R	Î	■
9	F	L	A	M	A	■	E	N	E

ÇEP-RAST

1. Dijberê rengê spî... Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê
2. Postê gurandî... Dema mirov şîr bidoşe û dest nede tebaqeya bi ser dikeve, qeymax
3. Vexwarina sereke... Navçeyeke Mêrdînê
4. Amadebûna hilanîna lengerê kêştiyê
5. Cureyekî zad ku piranî şorbe pê tê çêkirin
6. Bi rûsî erê... Encam, netîce
7. Notayek... Ji vir û şûn de, ji niha pê ve
8. Xwarina ku bêhna dû di çêja wê de pêk hatiye... Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî
9. Baneşana keserê... Mektûb

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1				■				■	
2		■					■		
3	■			■					
4						■		■	
5		■					■		■
6			■		■				
7	■			■				■	
8							■		
9		■			■				

JOR-JÊR

1. Yezdanekî misrî... Genimê hêrayî... Kurteya beriya zayînê
2. Birayê bavê mirov... Xweliya piştî şewatê
3. Bi şev çêrandina pez... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê
4. Hest û daxwaziya tolhildanê... Baneşana kêfxweşiyê
5. Zengil... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê
6. Roja em tê de ne... Cihê ku ka lê tê berhevkirin
7. Rêxistina polîsan ya Naziyan... Pirsek di rewşa ne tewandî de
8. Rastêşek... Tevgera hewayê... Cînava pirjimariyê ya xwerû
9. Ferişteyên bihuştê... Navber, mesafe

Quncika têgînan

Aram	**Asûde, amin, emîn, rehet, hêmin: Gundê me aram e, ti nexweşî û teşqele tê de nînin.**
Asîmîlason (Fransî)	Bi darê zorê helandina civekekê ji aliyê nasname, çand û ziman ve: Ji ber zordariya dagîrkeran bi milyonan Kurd asîmîle bûne.
Berpirs (Fransî)	Kesê ji ber karê kirî, yan erkê girtî ser xwe neçarê hesabdayînê ye. Mesûl: Berpirsê saziyê alîkarî belav kir.
Kampanya (Îtalî)	1. Di qada siyasî, aborî, çand û hwd. de pêvajoya çalakiyan: Ji bo paqijkirina kolanan şaredariyê dest bi kampanyayê kir. 2. Ji bo firotinê, erzankirina mal. Bazirganan dest bi kampanya erzaniyê kiriye.
Kompanya (Îtalî)	Şirîkatî û hevpariya di bazirganiyê de. Bi giranî ji bo biyaniyan. Şirket, şerîke: Kompanya Emerîka petrolê dertîne.
Operasyon (Fransî)	1.Rêzeçalakî. 2. Ji bo girtina sûcdaran rêzeçalakî. 3. Emelî.
Pêşbazî/pêşbirk	Di zanebûn, behre, bedewî û hwd. de, karê ji bo nîşandana serkeftinê: Pêşbirka bazdanê dest pê kir.
Vegotin	Gotina berfireh. Îzah. Sedema çalakiya xwe bi berfirehî ji me re vegot.
Venêrîn	Kontrol, fehs: Li ser bendê endamên asayişê li her kesî venêrîn. Doktor li nexweşan venêrî.
Pêşangeh	Ji bo ger, dîtin û naskirinê, raxistin û bicîkirina berhemên huner: Her sal meha Nîsanê pêşangeha pirtûkan vedibe.

Li Swîsreyê ji ber helîna qeşayê ser hezarî re golên nû çêbûn

Ji ber guherîna avhewayê ya du sed salên dawî, li Swîsreyê zêdeyî 1000 golên nû çêbûn. Vê rewşa nû dîmenê çiyayên Alpê yên Swîsreyê guhert.

Li gorî envantera berfireh ya golên qeşayî yên Swîsreyê, ji sala 1850'î vir ve nêzî 1200 golên nû çêbûne. Ji van golan 1000 jê hê jî hene.

Li gorî lêkolîna Teknolojî, Zanistiya Avê ya Federal ya Swîsreyê, bi helîna qadên qeşayî bendên xwezayî ava xwe berdan û di encamê de golên nû çêbûn.

Berpirsyarê tîma lêkolînê ya Teknolojî, Zanistiya Avê ya Federal ya Swîsreyê Daniel Odermatt li ser karê xwe daxuyanî da û got, zêdebûna jimarê û leza çêbûna golan em matmayî hiştin.

Lêkolîner diyar kir ku ji destpêka vê lêkolînê ve giranî dane ser çend sed golan û got, 180 ji van golan di nava deh salên dawî de di lîsteyê de hatin bicihkirin.

Odermatt da zanîn ku çêbûna van golan ji bo lêkolînkirina bandora guhertina avhewayê ya li ser golên qeşayî destpêkeke baş e.

Li gorî rapora salane ya Akademiya Zanistiyê ya Swîsreyê, ji sedî 2 qeşa li Alpê yê Swîsreyê vê sala dawî heliya.

Dibistana Polîteknîk ya Federal ya Zurichê jî hişyarî dabû ku peymana Parîsê ya ji bo kêmkirina guhertina avhewayê pêk were jî qeşa li çiyayên Alpê wê ji sê paran du parên wê bihelin.

Lêkolîner dibêjin, guherîna li çiyayên Alpê ispata berçav ya guhertina avhewayê ye. Zanyaran bîr xist ku di navbera salên 2006-2016'an de gol gelek zû çêbûn û her sal li derdora 18 golên nû çêdibin.

ANF

Tûrikê Çîvanokan

Di tûrikê me de îro sirûda li ser leglegê heye. Legleg bi wî nikulê xwe yê sor û dirêj, bi wê gerdena xwe ya dirêj û xweşik, bi wan çîpên xwe yên dirêj bala mirovan dikişîne ser xwe û jê hes dikin. Legleg ajeleke koçber e. Havînê diçe zozanan, zivistanê xwe berdide germiyanan. Legleg hêlîna xwe li ciyê bilind çêdike û ti kes hêlîna wê xerab nake. Dema keyfa wê li cî be nikulên xwe li hev dixe û dike şeqeşeq. Ti caran ziyanê jî nade mirovan. Li hin herêmên Kurdistanê jê re dibêjin leyleg.

LEGLEG

Leg û leg ez legleg im
Çûme Hecê Hacîbeg im

Bêziyan im tobedar im
Li ser banan nobedar im

Ne ji haciya ne ji baciya
Kul bikeve her du ciya

Ez legleg im gerdengaz im
Li ser şaxê dar dirazim

Çîpdirêj im porbelek im
Gerden sipî pîxelek im

Nikulsor im bileqleq im
Tim li jor im bişeqşeq im

KCK: Êrişên qirkirina Kurdan bêbersiv namînin!

KCK'ê di daxuyaniya xwe de teqez kir ku berpirsên êrişên li dijî Kurdan AKP/MHP ne û got, yên ev êriş bi rêxistin kirîn û pêk anîn, teqez wê hesab ji wan bê pirsîn. *R-4*

Li deriyê Sêmalka danûstandina PDKê bi Kurdan re

Li deriyê sînor yê Sêmalka yê di navbera Rojava-Başûrê Kurdistanê de ku ji 2013'an û vir ve tim pirsgirek lê hene, vê carê jî bi tifaqa MÎT-PDK'ê hin planên din tên bicihanîn. *R-5*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 883 25-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

'Vegera welat erk e'

Ew her çiqas bi salan li Ewropa xebitîbe jî li wir xwe biyanî his dikir û hesreta welat ber bi çiyayên Kurdistanê ve dikişand. Wî digot, ji bo şoreşgerekî vegera welat erkek e. *R-7*

STÛYÊ XWE XWAR NEKİN XWE Bİ RÊXİSTİN BİKİN

KCK: Em bang li gelê Kurd dikin ku li hemberî êrişên nijadperestan hevgirtinê xurt bikin û ji bo bidawîanîna van êrişan têkoşîna azadî û demokrasiyê li her derê geş bikin.

Li Dêrazorê di êrişa ser malekê de du jin hatin kuştin

» Her ciyê hişmendiya DAIŞê lê hebe li wir kuştina jinan jî heye. Vê carê jî kesên nenas li bajarokê El-Bisêra yê Dêrazorê êrişî malekê kirin. Di encma êrişê de du jin hatin kuştin, 3 kes jî birîndar bûn. *R-2*

Rêveberiya Sotemeniyê ya Tebqa para yekê ya mozotê belav kir

» Rêveberiya Sotemeniyê ya Rêveberiya Sivîl ya Tebqa para yekê ya mazotê li welatiyan belav kir. *R-6*

Statûya Kurdan çarenûsa Rojhilata Navî ye

» Naskirina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bûye rojeva cîhanê. Li ser mijarê Sîham Dawid got, ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser demokratîk e, hêzên desthilatdar naxwazin statûya wê hebe. *R-3*

4 Destkeftiyên Rojava Biparêzin.
Ednan Mustafa

6 Lozana îro NATO
Faruk Sakik

7 "Ilim li Çînê be jî herin peyda bikin."
Sipan Şînda

Li Dêrazorê di êrişa ser malekê de du jin hatin kuştin

Her ciyê hişmendiya DAIŞê lê hebe li wir kuştina jinan jî heye. Vê carê jî kesên nenas li bajarokê El-Bisêra yê Dêrazorê êrişî malekê kirin. Di encma êrişê de du jin hatin kuştin, 3 kes jî birîndar bûn.

Nûçegihana ajansa nûçeyan Hawr ji Dêrazorê ragihand ku kesên nenas ku li motorsiklêtekê siwar bûn, êrişî mala Beşar Xelîl El-Etwan ya nêzî firûna El-Rawî ya li navenda bajarokê El-Bisêra, kirin.

Kesên nenas gule li malbata Beşar El-Etwan reşandin. Di encamê de Beşar birîndar bû û hevjîna wî yekser jiyana xwe ji dest da.

Herwiha hevjîna Hesen Hemîdî El-Asî ya ku li mala Beşar bû, hate kuştin û du zarokên wê jî birîndar bûn.

Zarokên birîndar li nexweşneyên herêma Dêrazorê tên dermankirin.

ANHA

46 roj in agahî ji nûnerên Rêveberiya Xweser û PYD`ê nayê girtin

Revandina nûnerê Rêveberiya Xweser û endamên têkiliyan yên PYD`ê ji aliyê çekdarên PDK`ê ve kete roja 46an û hû jî çarenûsa wan ne diyar e.

10`ê Hezîranê, çekdarên PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD`ê Mustefa Xelîl û Mustefa Ezîz ku ji bo pêşwazîkirina mêvanên xwe, berê xwe dabûn balafirgeha Hewlêrê, revandin.

Ji wê demê ve tevî xwestekên Rêveberiya Xweser û PYD`ê, PDK cihê endamên revandîn û sedema revandina wan, diyar nekiriye.

Dayîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser roja yekê ya revandina nûneran daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Em dibînin ku ev kiryar aloziyê kûrtir dike û riya diyalogê lewaz dike. Ji ber wê em hêvî dikin ku ti aliyên başûrê Kurdistanê

di vê pêvajoya hesas de nekevin pey projeyên provokatorî yên ku dewleta tirkî yên derxstina şerê navxweyî." Her wiha daîreyê banga eşkerekirina çarenûsa endamên hatîn revandin kir.

ANHA

12 çete hatin kuştin, 9 jî birînda bûn

HRE bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan li Efrîn û Babê yên dagîrkirî li dijî dagîrkeran rêzeçalakî kirine. Di encamê de 12 çete hatine kuştin, 9 çete jî birîndar bûne.

Hêzên Rizgariya Efrînê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan li dijî kiryarên hovane yên dewleta tirkî ya dagîrker yên li hemberî gorên şehîdên Efrînê, yên di navbera 16 û 19`ê Tîrmehê de, li Efrîn û Babê rêzeçalakiyên bibandor li dar xistine.

Daxuyaniya HREwiha ye:

"Di roja 16`ê Tîrmehê de, li gundê Elemdara yê navçeya Raco, ji aliyê yekîneya Şehîd Avesta ve çalakiyeke sabotajê hat lidarxistin. Di encama vê çalakiyê de 3 çete hatin kuştin, çeteyek jî brîndar bû. Di roja 18`ê Tîrmehê de, li bajarê Efrînê, li taxa Vêlat, çalakiyeke sabotajê hat lidarxistin. Di encama vê çalakiyê de erebeyek hat teqandin, 2 çete jî birîndar bûn. Di roja 19`ê Tîrmehê de, li herêma

Babê li hemberî çeteyên dagîrker çalakiyek hat lidarxistin. Di encama vê çalakiyê de 2 erebeyên bidoçka hatin roxandin û bi qasî hatî zelalkirin, 7 çete hatin kuştin, 5 çete jî birîndar bûn. Di heman rojê de, li gundê Kilcibrîn yê navçeya Ezazê, di encama çalakiyekê de 2 çete hatin kuştin, çeteyek jî birîndar bû.

Di wan çalakiyan de bi giştî; 12 çete hatin kuştin, 9 çete jî birîndar bûn.

Ev çalakî ji bo tolhildana kiryarên dermirovî yên dewleta tirkî ya dagîrker yên li hemberî şehîdgeheke Efrînê, hatine lidarxistin."

ANHA

Çalakiya greva birçîbûnê bi biryardarî didome

Çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo azadiya rêber Abdullah Ocalan û rakirina binpêkirinên mafan yên li dijî girtiyan, li girtîgehan, Mexmûr û Yewnanistanê bi biryardariyeke xurt dewam dikin.

ZÎNDAN

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîdê û azadiya rêber Abdullah Ocalan û bidawîkirina zordariya li girtîgehan ku 27`ê Mijdarê ji aliyê gitiyên ji doza PKK û PJAK'ê ve hatibû destpêkirin, di roja 241 de dewam dike.

Girtî diyar dikin ku li gel zext û zordariyê jî heta tecrîd bi dawî nebe çalakiya xwe ranewestînin û bi biryardarî bidomînin. Herwiha bang li gel dikin ku li çalakiyên greva birçîbûnê xwedî derkevin.

MEXMÛR

Li Wargeha Penaberan ya Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) jî li dijî tecrîda li Îmralî, bi pêşengiya jinan 18'ê Kanûnê çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakî li Komeleya Malbatên Şehîdan ya Mexmûrê di roja 220an de dewam dike.

Şêniyên wargehê di çalakiya xwe de bibiryar in û diyar dikin ku heta tecrîd neyê şkandin û zordariya li zîndanan tê meşandin neyên rakirin, wê çalakiya xwe ranawestînin.

YEWNANISTAN

Welatiyên li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî, ji bo bidawîkirina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û xwedîderketina

li çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan dest pê kiriye, bi israr çalakiya xwe didomînin.

Çalakiya ku bi pêşengtiya Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ) Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê hatiye destpêkirin, di roja 203an de dewam dike.

ANHA

Ji Antî Teror û Koalisyona Navneteweyî Operasyoneke hevbeş

QSD`ê da zanîn ku Yekîneyên Antî Teror û hêzên Koalisyona Navneteweyî, li rojhilatê Hesekê li hemberî şaneyeke bixeter ya DAIŞ`ê ya ji gelek bûyerên kuştina sivîlan berpirs in, operasyoneke hevbeş kirine.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê têkildarî operasyona hêzên QSDê û Koalisyona Navneteweyî ya li dijî şaneyên çeteyên DAIŞ`ê li ser malpera xwe ya fermî, daxuyaniyeke fermîweşand.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:

"Roja 21`ê Tîrmehê, Yekîneyên Antî Teror û hêzên Koalisyona Navneteweyî, li gundê Xirbet Camûs yê rojhilata Hesekê li hemberî şaneyeke bixeter ya DAIŞ`ê ya ji gelek bûyerên kuştina sivîlan berpirs operasyoneke hevpar li dar xistin.

Di operasyonê de endamên şaneyê ji bo ku bikarin birevin, şer derxistin. Di vî şerî de şervanekî me şehîd bû. Piştî şer, hêzên Koalisyona Navneteweyî li hemberî nuqteya çeteyan êrişeke hewayî bi du fûzeyan kir. Di encama vê operasyonê de 2 çete hatin kuştin, 2 çete jî hatin girtin.

Di dema ku hêzên me li cihê bûyerê lêgerîna xwe ya destpêkê dikirin, rastî cenazeyê zarokekî kuştî hatin. Ji bo zelalkirina sedema kuştina wî zarokî hêzên me wê bi çeteyên hatîn girtin lêpirsînê bikin."

ANHA

Îro foruma Kurd–Ereb li dar dikeve

Rêxistina Geşedan û Pêşketinê wê îro bi navê "Di çarçoveya geşedanên rojane û zehmetiyan de girîngiya pêwendiyên Kurd û Ereban" Forumekê li dar bixe.

Foruma ji aliyê Rêxistina Geşedan û Pêşketinê ve tê organizekirin, wê bi rengê Zoom (înternetê) were lidarxistin. Di forumê de ku wê gelek rewşenbîr û akademîsyenên Kurd û Ereb tevlî bibin, wê mijarên wek, "Di vê demê de çima pêwendiyên Kurd û Ereb?", "Li hemberî destwerdanên ser herêmê rola Ereb û Kurdan" û "Paşroja danûstendinên Kurd û Ereban" werin gotûbêjkirin

Forum wê îro li gorî saeta Qahîre-Bruksel di saet 17.00'an de û li gorî saeta Şam, Bexda û Beyrûdê jî di saet 18.00'an de dest pê bike. Forum di heman demê de wê ji aliyê Ronahî Tv ve, bi awakî zindî were dayîn.

ANHA

'Vegera welat erk e'

Ew her çiqas bi salan li Ewropa xebitîbe jî li wir xwe biyanî his dikir û hesreta welat ber bi çiyayên Kurdistanê ve dikişand. Wî digot, ji bo şoreşgerekî vegera welat erkek e.

Di diroka Kurdistanê de gelek hunermendên şoreşger yên nemir hene ku ew qet nayên jibîrkirin. Yek ji wan hunermendên şoreşger ku ji bîr neçûye û her tim Kurd li deng û tembûra wî guhdar in Hozan Serhat (Suleyman Alpdogan) e. Di ser şehîdbûna Hozan Serhat re 22 sal derbas bûn lê ew bi kesayet, tembûr û sekna xwe hê jî di hişê civaka Kurd de zindî ye. Hozan Serhat hem hunermendê gel hem jî şervanê gelê xwe bû. Wî ev her du kar bi serkeftî bi rê ve birin û bê dudilî li ber xwe da. Di hemû kêliyên jiyana xwe de bi rihekî afirîner tev geriya û berhemên muzîka şoreşger derxist holê. Ew her çiqas bi salan li Ewropa xebitîbe jî li wir xwe biyanî his dikir û hesreta welat ew ber bi çiyayên Kurdistanê ve dikişand. Wî digot, ji bo şoreşgerekî vegera welat peywirek e.

Bû pîvana mûzîka şoreşger

Hozan Serhat piştî xebata bi salan ya li Ewropa li Kurdistana xwe vegeriya. Di destekî de çek û di destê din de jî saza wî hebû. Di hemû şevbuhêrkên gerîla de dengê tembûra wî bilind dibû û stranan digot. Ew dizanîbû heya civaka Kurd azad nebe û Kurdistan ji dagirkeran xelas nebe hunereke azad jî mixabin dê çênebe li ser axa Kurdistanê. Nexasim ew dixwest derbasî Bakur ango herêma Botanê bibe û li wir şer bike. Ji lewre Bakurê Kurdistanê di bin dagirkerî û mêtingehiya dewleta Tirk de bû û ew jî dixwest li hembêr qirkirina dewleta Tirk têkoşîna xwe dewam bike. Hozan Serhat bi vê armancê derbasî Bakur dibe. Lê Bakur lê tê xezebê û Hozan Serhat di 22'yê Tîrmeha 1999'an de di pevçûneke li navçeya Elkê ya Şirnexê de şehîd dibe. Hozan Serhat li pey xwe gelek stran dihêle û her wiha pîvanên muzîka şoreşger.

Di 7 saliya xwe de li tembûrê dixe

Hozan Serhat di sala 1970'yî de li navçeya Zêtkan a Agiriyê ji dayik dibe û ji pênç xwişk û birayên malbatê yê herî piçûk e. Piştî wefata bavê xwe bi malbatî koçî Panosê dikin. Zarokatî û ciwantiya wî li Panosê derbas dibe û dibistana navîn û lîseyê li vir dixwîne. Lê belê Hozan Serhat di temenê xwe yê biçûk ango hêj di 7 saliya xwe de meraqa hunerê pêş dikeve. Di malê de birayê wî Arîf Alpdogan li tembûrê dixe, li hemberî tembûrê meraqî wî jî çê dibin û tembûra birayê xwe ji destên xwe danayne. Ev daxwaza wî

ya hînbûna tembûrê û eleqeya hunermendiyê di demek kin de digihîne armanca xwe. Her çendî Hozan Serhat rastî bertekan bê jî ew dest ji hewldana xwe ya hînbûna tembûrê bernade û di demeke kurt de newayên tembûrê derdixe holê. Bi vî awayî malbat jî piştgirî dide wî û ew di muzîkê de bêhtir xurt dibe.

Bala wî li ser kurdî ye

Hozan Serhat di 18 saliya xwe de Beşa Konservatûrarê ya Dewletê ya Muzîka Tirkî û Zanîngeha Egeyê ya Izmîrê bi dest dixe. Piştî diçe konservatûrarê dest bi amûra muzîkê ya azerî (tar) a bi du têlan ku wekî horguçlu tê zanîn dike. Ligel vê li bilûr, gîtar, tembûr û klavyeyê jî dide. Hozan Sehat di warê teknîka muzîkê de xwe gelek pêş dixe lê ew di heman demê de li ser çand û muzîka Kurdî jî radiweste û lêkolînan dike. Di serdema konservatûarê de hewildanên ku Hozan Serhat bikişînin nav pişaftina jidûrxistina ji kurdewarî zêde çê dibe. Her wiha di heman demê de birayê Serhat, Arîf Alpdogan jî xwendekarê konservatûarê ye. Her çiqasî dixwaze wî di aliyê klamên Tirkî yên herêma Egeyê de bikişîne jî Hozan Serhat bi gotinên wekî "Heman meqam di nav Kurdan de jî heye, bi taybetî di beşên hîcazê de hêj otantîk, xweştir û bi hêstewar in" bersivê dide, hemû hewldanên kekê xwe red dike. Hozan Serhat bi gelek amûrên cuda çandeke muzîkê derdixe holê û li ser stranên herêma Botan û Serhedê radiweste û klama "Batmane Batmane" şîrove dike.

Felsefeya tevgera azadî nas dike

Dema sal meha sibatê 1991'an dide nîşa, êdî Hozan Serhat di gelek aliyan de xwe bi pêş xistiye û êdî hişmendiyeke neteweyî jî derketiye holê û li gorî vê hişmendiyê dest bi têkoşîna jiyanê dike. Wekî her kesên ku ji xwe re digotin em hunermendên Kurd in tevnedigeriya. Di her qadê de cudahiya xwe dida xuyakirin û li gorî wê teşe dida jiyana xwe. Tenê nedixwest di warê hunerê de xizmetekê bike, her tim hiş û guhê wî li ser têkoşîna azadiya gelê Kurd bû. Hozan Serhat piştî bi felsefeya Tevgera Azadiyê (PKK'ê) hişmendiya xwe kûr dike, di sala 1991'an de bi hevjîna xwe ya bi navê Yildiz re di meha Tîrmehê de berê xwe dide çiyayê Kurdistanê û ji bo azadiya gelê kurd û Kurdistanê dest bi têkoşînê dike. Piştî her yek di komekî de cih digire, demek şûnde Yildiz li Cizîra Botanê tê girtin û rastî 12 sal 6 mehan cezayê girîtîgehê tê.

Divê şoreşger li welat vegerin

Hozan Serhat êdî hem hunermend û hem jî şervanê doza gelê Kurd bû. Piştî ku Hozan Serhat di nava Tevgera PKK'ê de cihê xwe digire ne tenê di warê şervantiyê de di heman demê de li ser xebata ku bi salan dikir di warê çand û hunera kurdewarî de jî xebatên xwe pêş xist û berfireh kir. Lewma têkoşîn yek alî nedimeşiya. Ji ber kar û barên muzîkê Hozan Serhat diçe Ewrûpayê û di Hunerkomê de cih digire. 4 salan li vir dimîne. Ligel xebatên ku pêşdixe jî li welatê xerîbiyê nema dikare bisekine. Her çendî di aliyê muzîk û amûran de xwe bi pêş bixe jî Hozan Serhat diyar dike ku; "Ji bo şoreşgerekî vegera welat peywîrek e" Herî dawî di sala 1996'an de vedigere Kurdistanê. Piştî demekî li Zapê dimîne, derbasî Navenda Çand û Hunerê ya Mezopotamyayê ya li Hewlêrê dibe û li vir xebateke berfireh dimeşîne.

Berhemên wî

Hozan Serhat bi derfetên teng tiştên nû diceriband û hestên wî yên şoreşger dihişt ku ew stranên baş derxe holê. Di berhemên wî yên muzîkê de berxwedan û têkoşîna gelê Kurd hebû. Dilsoziya dilê wî rengê xwe dida ser stranên wî jî. Ji ber vê dilsoziya wî Hozan Serhat îro jî bi stranên xwe di dilê civaka Kurd de ye dengê stranên wî li hemû perçeyên Kurdistanê bilind dibin. Ew tenê ne bi Kurmancî, her wiha bi Kirmanckî û Soranî jî digot. Çend berhemên Hozan Serhat yên tên zanîn wiha ne, "Hewlêr", "Mizgîna Leheng", "Ax Kurdistan", "Wunken", "Payîz e", Şêr e Şêr e" "Beyadî", "Sîpanê Xelatê", "Çûka Serê Darê" û "Ser Banîka".

Ozgûr Polîtîka

"Ilim li Çînê be jî herin peyda bikin."

Sîpan Şînda

Îro derfetên xwendinê ewqas zêde bûne, ez welê bawer dikim ku êdî ti hêcet ji ti kesî re nemane ku bêjin derfet nînin em zarokên xwe bidin xwendin. Ji ber ku teknolojyê îro dibistan û zanîngeh anîne di malên me de, bi saya serê teknolojyê êdî ne malên me, berîkên me jî bûne pirtûkxane. Em li kû derê dibin bila bibin, êdî hewce nake ku em pirtûkan bi xwe re bigerînin, ji ber ku her yek jî me telefonek di destê de ye û em dikarin her tiştî di wir de qeyd bikin û bixwînin. Lê ka em berê xwe bidine rewşa xwendevanên me û armanca xwendina wan.

Bi taybetî di nava van 20 salên dawî de li bakûrê Kurdistanê rêjeya xwendayan di nava Kurdan de gelekî zêde bûye. Hingî sal bi hezaran zarokên Kurdan diçin zanîngehan û di beşên cuda de dixwînin. Çend salan ji malbata xwe dûr in û bi zehmetî xwedina xwe didomînin. Lê gelo ew wan salên xwe çawa diborînin, ya girîng ev e. Mixabin pirên wan, wan salên xwe li gorî min "vala" derbas dikin. Rast e, ew dikevin ezmûnên xwe û wan didin, dîplomeya xwe jî distînin û paşê jî li benda karekî baş dimînin. Gelo ma hema ewqas? Ango xwendina zanîngehê ji bo zarokên Kurdan tenê bûyîna xwediyê karekî ye? Li ber dilê min divê armanca xwendinê û çûna zanîngehê ne tenê peydakirina karekî baş û rihet be. Di serî de, divê armanca wan ciwanên diçin zanîngehê giyan û mejiyê xwe têrkirin be. Divê ew bi ruhekî azad û mejiyekî azad bikarin bifikirin û li ser lingê xwe bisekinin. Ango divê ew zanîngeh xwendin kesayeteke welê bide wan ew azadiya xwe, nirxên xwe û rêgezên kesayeta xwe nekin gorî "meda" xwe. Divê ji bo ku ew bibin "memûrên dewletê" kesayeta xwe binpê nekin û bikarin di warê aborî de bê ku kar ji dewletê bixwazin xwe li ser lingên xe bigirin.

Lê mixabin li Bakûrê Kurdistanê kesên ku diçin zanîngehê dixwînin, pirê wan xwe pêş ve nabin û mejiyekî bikare xwe li hemberî hêza dewletê û pêsthûriya civakê bigire hema bêje dernakeve pêş. Bêguman malbatên ewqas kedê didin û zarokên xwe didin xwendin li bendê ne ku ew zarokên wan bikarin di warê aborî de xwe li ser lingên xwe bigirin. Lê divê ew ciwanên ku diçin zanîngehê dixwînin jî bikarin pêşengiyê ji malbat û derdora xwe re bikin û bi wê xwendina xwe wan ronî bikin. Lê mixabin pirê ciwanan di rewşeke welê de ne ku piştî wêqas xwendinê jî ti hizrên pêşketî bi wan re nînin, ji ber ku ew naxwînin û lêkolînan nakin. Ji ber wê piştî zanîngehê diqedînin jî ew dîsa dibin bar û piştî li ser milê malbata xwe. Li şûna ew rêbertiyê ji malbata xwe re bikin, wan bi fikrên nûjen ronî bikin, hê jî hêviyan ji malbata xwe dikin. Li gorî min ev rewşeke pir xirab e ku ciwanên me tê de ne. Jixwe ji ber vê rewşê ye ku gelek ji wan dikevin nava depresyonê. Ew ciwanên ku nikaribin pêşengiyê ji civakê re bikin, ew ciwan mirî ne. Divê ruhekî serhildêr bi ciwanan re hebe. Lê divê di serî de ji bo xwe bikarin çareseriyan peyda bikin. Ciwanê ku ne xwediyên ruh û mejiyekî afirîner be, wê ew ciwan nekaribe ti roniyê bide civakê jî. Divê armanca wan ne tenê standina dîplomeyekê û bi wê dîplomê zikê xwe têrkirin be. Armanca xwendinê ya bingehî divê mejî û giyan têrkirin be.

Rêveberiya Sotemeniyê ya Tebqa para yekê ya mozotê belav kir

Rêveberiya Sotemeniyê ya Rêveberiya Sivîl ya Tebqa para yekê ya mazotê li welatiyan belav kir.

Rêveberiya Sotemeniyê ya Tebqa pistî ku para yekê ya mazota germkirinê li gundên bakurê bajêr belav kir ku ji gundên Siwêdiyê, El-Cirniyê, Mehmûdiyê û Saykol pêk tên, li meclisên bajarê Tebqa û Ayid û El-Bû asî jî belav kir.

Hevserokê Rêveberiya Sotemeniyê ya Tebqa Faris El-Ezawî li ser mijarê ev agahî dan:" Miqdara para yekê li gorî kartekê 220 lître mazot e. Li aliyekî din jî jimara malbatên ku navên xwe li rêveberiya sotemeniyê ya bajarê Tebqa tomar kirine 53 hezar e. Belavkirina para yekê wê li derdora 3 mehan dewam bike. Ango heta para duduyan ya belavkirina madeyê dest pê bike." Bi hevkariya stasyonên sotemeniyê û navendên gazên malê, mekanîzmayek ji bo xebata kartên sotemeniyê hat danîn da ku barê welatiyan sivik bibe û bi hêsanî sotemeniya malê bi dest bixin.

Fairs El-Ezawî diyar kir ku mazotê di vê demê de hat belavkirin da ku rê li pêşiya zexta muhtemel e di zivistanê derkeve bigirin. Rêveberiya Sotemeniyê mazotê dide qada çandiniyê da ku zeviyên xwe av bidin.

Rêveberiya Sotemeniyê ya Tebqa zexta li ser peydakirina gaza malê sivik dike. Ji her karteke sotemeniya malbatê re mehane 10 lître gaz dide.

ANHA

Koçberên li Şehba di berxwedanê de biisrar in

Koçberên Efrînî yên li kantona Şehba gotin, UNICEF bi kêmkirina miqdara ava vexwarinê ji mirovayiya xwe derketiye û xizmeta ajandeyên hêzên herêmî dike.

Li kêleka topbarana rojane ya dewleta tirkî ya dagîrker û dorpêça ji aliyê hikumeta Şamê ve li dijî Şehba û qedexekirina derbaskirina pêdiviyên xwarinê, tenduristiyê û sotemeniyê ya kantona Şehba, rêxistina UNICEF ji 11`ê Tîrmehê ve miqdara ava vexwarinê ya koçberên Efrînê yên li Şehba kêm kiriye.

UNICEF`ê di dirêjayiya 3 sal û nîvê de, rojane nêzî 2 hezar û 400 mitrekab av dida koçberên Efrînê, lêbelê ew miqdar daxist nêzî hezar mitrekab av. Bi wê yekê ava vexwarinê ji ser nêzî 80 hezar mirovên ku bi dehan gund û 3 navçeyên mezin ên Şehbayê dijîn, qut kir.

Biryara kêmkirina avê ji ser koçberên li Şehbayê pistî biryara Meclisa Ewlehiyê ya NY pêk hat, ku dema girtina dergehê Til Koçer li pêşiya alîkariyên mirovî dirêj kir û dergehê Bab El-Hewa yê di binê dewthilatiya komên çeteyên girêdayî dewleta tirkî de yê li parêzgeha Idlibê vekirî hişt.

Koçberên Efrînî dibêjin, rêxistinên mirovî ji mirovayiya xwe derketine û xizmeta ajandeyên hêzên navneteweyî dikin.

Efrîniyên li Şehbayê dimînin herwiha diyar dikin ku rêxistina UNICEF ji beriya zêdetirî 2 hefteyan ve bi behaneya ku rêxistinên navneteweyî alîkariyên ji bo koçberên li Şehbayê kêm kirine, depoyên avê tijî nekirine.

'piştgiriyê didin çeteyan û bi sedhezaran koçberan ji bîr dikin'

Welatiyê bi navê Ebdo Qere Mihemed têkildarî mijarê ji ajansa nûçeyan Hawar re wiha got: "Hin rêxistinên mirovî di binê navên mirovî de kar dikin, lê bi nêzîkatiyên xwe yên li dijî koçberên li Şehbayê dûrî karên mirovî ne."

Mihemed ji ber dualîtiya pîvanên navneteweyî mixabiniya xwe anî ziman û ev pirs kir: "Gelo çima civaka navneteweyî piştgiriyê dide komên çeteyan yên li Idlibê û bi sedhezaran koçberên ji ber êrişên dewleta tirkî û çeteyên wê yên ser Efrînê ji malên xwe dekretin, ji bîr dike?"

Qere Mihemed behsa siyaseta hikumeta Şamê ya li dijî koçberan jî kir û wiha dewam kir: "Li şûna ku hikumeta Şamê alîkariyê bide welatiyên li Şehba, hewl dide wan qir bike û nahêle ku ava vexwarinê, derman, sotemenî û şîrê zarokan derbasî herêmê bibin."

'UNİCEF li dijî mirovayiyê şaştiyan dike'

Têkildarî heman mijarê hiqûqzan Cibraîl Mistefa jî qutkirina ava vexwarinê li ser koçberên ku bi darê zorê ji malên wan hatine derxistin, wek sûcekî li dijî mirovayiyê bi nav kir. Mistefa di axaftina xwe de bal kişand ser êşa bi sedhezaran koçberan û şêniyên resen yên herêmê û welatiyên li kampan.

Mistefa diyar kir ku UNICEF li dijî mirovayiyê şaştiyan dike û got, parastina zarokan ji armancên sereke yên UNICEF`ê ye, lê belê bi hezaran zarokên koçber li Şehba di mercên giran de ne.

Hiqûqzan Cibraîl Mistefa bi domdarî wiha got: "Em baş dizanin dema rêxistinên mirovî piştgiriyê didin welatiyên li herêmên şer yên li welatên cîhanê, berê xwe didin hikumeta navendî ya wî welatî. Lêbelê dema hikumeta navendî koçberan wek welatî nehesibîne, ew rêxistin tên polîtîzekirin û li gorî sîstemên navneteweyî kar dikin. Mînaka wê hikumeta Sûriyê û rêxistinên di binê fermana wê de kar dikin in."

Ji bo çareserkirina vê mijarê, Cibraîl Mistefa bang li rêxistinên navneteweyî kir ku hevkariyê bikin û eşkere bikin ku pirsgirêka sereke ew e ku hikumeta navendî hewl dide tevayiya derfetan ji bo tinekirina gelê Şehba bi kar bîne.

Mistefa xaftina xwe wiha bi dawî kir: "Eger UNICEF û rêxistinên din bi riya hikumeta Sûriyê alîkarîdayîna koçberan bi berdewam bikin, wê rewşa me di rojên pêş de xerabtir bibe."

'Av li ser zêetirî 80 hezar welatiyan hatiye qutkirin'

Cîgirê hevserokê Meclisa Kantona Efrînê Mihemed Ebdo jî da zanîn ku UNICEF jî di navê de rêxistinên navneteweyî, ji mafên koçberên li Şehba berpirsiyar in.

Ebdo wiha got: "Mixabin di rojên dawî de rêxistina UNICEF biryareke siyasî ya kêmkirina miqdara ava vexwarinê li kantona Şehbayê girt. Bi wê yekê ava li ser zêdetirî 80 hezar welatî û koçberên li Şehbayê yên di mercên zehmet de ne, qut kir."

Ebdo bal kişand ser şert û mercên dijwar ên koçberên Efrînê li kampan û malên nîvroxandî derbas dikin û got, pileya germê zêde dibe, rewşên nexweşiyê yên ji ber germê û vexwarina ava nepaqij jî zêde dibin."

Ebdo behsa hewldanên têkbirina berxwedana koçberên Efrînê yên li Şehbayê di mercên giran de ne û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Rojane artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê herêmê topbaran dikin. Hikumeta Şamê jî herêm dorpêç kiriye. UNICEF jî di navê de rêxistinên di binê navên mirovî de kar dikin bi wan aliyan re hevkariyê dikin."

ANHA

Lozana îro NATO

Farûk SAKIK

Di 27ê Sibata 1923'yan de, di civîna girtî ya meclisê de gava Ismet Paşa biryara Peymana Lozanê ya ku Mûsil ji Ingilîzan re dihişt xwend, di serî de Yusuf Ziya mebûsên Kurd li dijî biryarê derketin û gotin, divê Kurd ji îro pê ve qedera xwe bi destê xwe destnîşan bikin.

Piştî vê bûyerê helwesta xwe wiha dianîn ziman: "Ingilîzan pêşniyariyek ji Tirkan re anî. Bi şertê ku eger Tirk li Kurdistanê otonomiyê ilan bikin, ewê jî, ji Mûsilê derkevin. Lê Tirkan ji bo otonomiyê nedin Kurdan, Mûsil dan Ingilîzan. Heta niha em difikîrîn ku Kurd û Tirk wê pirsa kurdî bi hev re di şerê li dijî dewletên emperyalîst de çareser bikin. Lê niha, jî gava ku hikûmeta Tirkiyê razî bû Mûsilê bide Ingilîzan, hemû heviyên me têk çûn."

Piştî ku ev hêvî têk çûn heta roja me Kurd li dû hêviyeke wisa neketin. Kurdan Tirk baş nas kiribûn. Ji bilî berxwedan û serhildanan li pêşiya wan ti rê nemabûn.

Hêviyên xwe ji hêzên derve jî qût kirin. Ew jî li gorî berjewendiyên xwe tev digeriyan. Dema ku Şêx Mehmûdê Berzencî li dijî vê biryara Lozanê derket di destpêkê de balafirên Ingilizan dest bi bombebarana Kurdistanê kirin. Ev bombebaran ti carî ranewestiya.

Piştî Şêx Mehmûdê Berzencî di sala 1925'an de, li ser dika dîrokê Şêx Seîd hebû. Wî jî li dijî vê peymanê, ji bo doza Kurdistanê şer kiribû. Ingilizên ku li dijî Şêx Mehmûdê Berzencî şer kiribûn, vê carê jî li dijî Şêx Seîd li kêleka dewleta tirkî cih girtin û serhildana Kurdan bi ser neket.

Di wan salên berê de, me hîle û lîstkên wan bi tenê di peymanan de didîtin, lê îro her tişt veşartî tê kirin. Di pişt perdeyan de ji bo dagîrkeriya dewleta tirkî ya li Kurdistanê dewam bike, em nizanin ka çi bertîl tên dayîn û girtin.

Îro Şerê Cîhanê yê Sisiyan, dîsa li heman herêmê, li ser xaka Kurdistanê dewam dike. Îro dîsa dewleta tirkî li vê herêmê li dû dagîrkeriya axa Kurdistanê ye.

Îro di dewsa xêzkirina sînoran de vê carê xetên neftê û dewlemendiyên herêmê tên xêzkirin. Dîsa li Kurdistanê ne. Vê carê li kêleka wan Emerîk ku di Şerê Cîhanê yê Yekê de tinebû jî heye.

Di van salên dawî de, dewleta Rûsya jî hat tevlî van têkiliyên gemar bû. Rûsan nobeta dijminatiya Kurdan ya sala 1923'yan îro ji Ingilizan girtine. Niha wan li Sûriyê ji bo ku Kurd nebin xwediyên statûyekê çi ji destê wan tê dikin.

Dijminaatiya dewleta tirkî dewam dikir. Ji rayedarên Rojava Hesen Koçer herî dawî ragihand ku Erdogan nehiştiye DAIŞ bi rejima Esad re şer bike. Berê DAIŞ'ê dan Kurdan. Jixwe emîrê DAIŞ'ê jî ev yek gotibû. Digot, eger bi vê qewetê me şer kiribûya emê çûbûna Şamê. Lê Erdogan berê wan da Kurdan. Lê şervanên Kurdan jî bi lehengiyeke mezin berê wan çeteyan dan goriştanê.

Ji bo dewleta tirkî Lozana nû NATO ye. Hemû hêviyên xwe bi vê saziya ve girê dane. Di zirweya sala 2021'ê de di hemû hevdîtinên xwe de ji bo siyaseta xwe ya tinekirina Kurdan piştgirî dixwest. Ev piştgirî, ji hin dewletên NATO'yê yên weke Almanya girt. Dema ji zirweyê vegeriyan, dozaja êrişên dagîrkeriyê zêdetir kirin.

Îro wê dîrok xwe dubare neke. Kurdên di pêvajoya Lozanê de hêviyên wan winda bûyîn, îro di binê pêşengiya Abdullah Ocalan de derbasî qonaxeke nû bûne. Serhildana dest pê kirî hêviyên mezin dane Kurdan. Îro gelê Kurd bi van hêviyan xwe diparêze.

Statûya Kurdan çarenûsa Rojhilata Navî ye

Naskirina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bûye rojeva cîhanê. Li ser mijarê Sîham Dawid got, ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser demokratîk e, hêzên desthilatdar naxwazin statûya wê hebe.

Dilîn EHMED-Qamişlo

Tevî dorpêç û şert û mercên ku Rêveberiya Xweser tê re derbas dibe, hewl dide tevayiya xizmetan ji gelê bakur û rojhilatê Sûriyê re pêşkêş bike. Ji bo xwedîderketina li kar û xebatê ya bi salan, ev demek e mijara naskirina Rêvebriya Xweser bûye rojeva cîhanê û kampanya haştagê ya #Status4NorthAndEastSyria dest pê kiriye. Fermandarê Giştê yê QSD'ê Mezlûm Ebdê jî bi daxuyaniyekê banga tevlêbûna kampanyayê kir. Herwiha gelek kesayetên siyasî yên navdar û hinek berpirsên hikumetên Ewropa jî piştgirî dan kampanyayê û di demeke kurt de li ser medya civakî bi sedhezaran mirov li seranserê cîhanê tevlî bûn.

`Bingehê Rêveberiya Xweser avakirina jiyaneke hevbeş e`

Têkildarî mijarê Sekretêra Giştî ya Partiya Sûriya Paşrojê Sîham Dawid di serî de malbatên şehîdan salvegera 19`ê Tîrmehê, li tevayiya gelê aşîtîxwaz, pîroz kir. Sîham Dawid diyar kir ku, avakirina Rêveberiya Xweser berhemek ji berhemên şoreşa Rojava ye û wiha berdewamî da gotinên xwe: "Ji bo avakirina jiyaneke birûmet û azad, Rêveberiya Xweser hat avakirin. Ev rêveberî ne ji bo neteweke tenê, ji bo tevayiya gelên bindest, dest bi kar û xebatê kir. Ji destpêkê ve Rêveberiya Xweser û Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) ji bo çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê, banga lidarxistina diyalogên aşîtiyê dikin. Heta niha jî dibêjin; çareserkirina pirsgirêkan bi diyaloga ye, ne bi şer e."

Sîham Dawid diyar kir ku bi avakirina dewlet-neteweyê re bi taybetî li Rojhilata Navî, hêzên desthiladar yên ku dixwestin desthiladariya xwe li seranserê cîhanê bidin meşandin, Kurdistan kirin çar parçe. Sîham axaftina xwe wiha domand: "Ji bo ku li Rojhilata Navî pirsgirêk her tim zindî bin, hêzên serdest ji bo berjewendiyên xwe, Kurdistan xistin binê dagîrkeriya çar dewletan. Ev hêz her tim Kurd, Ereb, Suryan û Asûran ku bi salan e bi hev re dijîn, li dijî hev nîşan didin. Armanca wan ew e ku, rê ji xwe re vekin û maf ji xwe re bibînin ku dest li her pirsgirka Rojhilata Navî werdin."

`Divê em li rêveberiya xwe xwedî derkevin`

Sîham Dawid bal kişand ser girîngiya naskirina Rêveberiya Xweser û wiha dewamî da axftina xwe: "Sîstema Rêveberiya Xweser tersê sîstema hêzên serdest e, ti kes nikare vê inkar bike. Gelên bi salan ji aliyê hêzên serdest ve hatîn bindestkirin, îro bi saya sîstema rêveberiyê bi zimanê xwe çand û hunera xwe li ser xaka xwe azad dijîn. Jixwe Rêveberiya Xweser li ser vî bingehî hat avakirin, ku li herêmê jiyaneke hevbeş ava bike. Ji ber wê pêwîst e di demeke kurt de Rêveberiya Xweser were naskirin." Sekretêra Giştî ya Partiya Sûriya Paşrojê Sîham Dawid bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser projeyeke demokratîk e, hêzên navdewletî yên serdest ji xwe re xeter dibînin. Lê gelên herêmê ev rêveberî hilbijartine û hembêz kirine. Ev rastiyek e û li ber çavê teyayiya cîhanê tê xuyakirin. Lê dijmin ji bo ku vê rêveberiyê reş bike û ji gel re bêje nikare pirsgirêkên we çareser bike, şerê taybet dide meşandin. Li hemberî vê rewşê divê gelê me hişyar be. Divê gelê me baş bizane ku tevî derfetên kêm û dorpêçkirinê, rêveberî her tim hewl dide ku pêwîstiyên wan bi cî bîne. Herwiha ji bo naskirina Rêveberiya Xweser divê gelê me her tim li ser piyan be. Çimkî eger em li destkeftiyên şoreşa xwe û li rêveberiya xwe xwedî dernekevin, ti kes lê xwedî dernakeve."

`Şoreşa jinê bû çavkaniya azadiya gelan`

Navenda nûçeya -Qamişlo

Piştî şoreşa 19`ê Tîrmehê çarenûsa xelkê Rojava hat nivîsîn. Endamên Kongreya Star yên bajarê Qamişlo dibêjin; ji bo parastin û pêşxistina destkeftiyên şoreşa Rojava emê berxwedana xwe xurttir bikin.

Bi berxwedan û têkoşîna gel, bi taybetî ya jinan, xelkê rojavayê Kurdistanê paşroja gelê Kurd, nivîsîn. Şoreşa Rojava bû çirûska ronîkirina riya gelên bindest, bi taybetî bû roniya riya azadiya jinê. Lewra bi fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, têkoşîna jinê heta asteke jor pêş keft. Berî şoreşê, ji ber siyaseta desthiladaran, di civakê de rola jinan hatibû tinekirin. Lê di şoreşa Rojava de, bi saya tevgera demokratîk, jin bû xwedîrol û bi têkoşîna azadiyê xwe di her qada jiyanê de bi cih kir. Ji bo wê dibêjin; şoreşa Rojava, şoreşa jinê ye.

'Fikir û felsefeya Rêbertiyê ji bo azdiya tevayiya jinan e'

Rêvebera Kongreya Star ya bajarê Qamişlo Rodîn Îsa, li ser şoreşa 19`ê Tîrmehê nirxandin kir û got, şoreşa 19`ê Tîrmehê jiyaneke nû ava kir û axaftina xwe wiha domand: "Şoreşa Rojava vejin e, lewra çarenûsa gelê herêmê bi jiyaneke wekhev hat nivîsîn. Bi berxwedan û lehngiya şervanan, şoreşê mohra xwe li dîrokê xist. Niha jî ya herî girîng û pêwîst ew e ku, gelê me ji bo misogeriya destkeftiyên şoreşê û xwedîderketina li xwîna şehîdan, li ber xwe bide. Bi taybetî jin, lewra bi pêşengiya jinê şoreş hat destpêkirin. "

Rodîn Îsa diyar kir ku tevayiya jinên cîhanê azadiya xwe, di fikir û felsefeya Rêbertiyê de dibînin û axftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi saya fikirê Rêberê xwe em gihîştine vê astê. Rêber APO ne ji bo jinên kurd tenê, ji bo azadiya jinên bindest tevan kar û xebat kir. Lewra pêşketin û hêzgirtina jinan tev bi saya Rêbertiyê ye. Ji bo wê her tim banga me ji jina re ew e ku, li keda Rêber Apo xwedî derkevin. Herwiha ji bo pêkanîna xewn û xeyalên şehîdan jî, divê em têkoşîna xwe pêş bixin û Rêberê xwe ji zindana faşistan rizgar bikin."

`Jinên li ser felsefeya Rêber Apo xwe bi rêxistin kirîn, îro pêşeng in`

Li ser heman mijarê endama Rêveberiya Kongreya Star Xaliya Necar jî wiha axivî: "Wek tê zanîn çirûska şoreşa Rojava ji Kobanê dest pê kir. Wek Yekîtiya Star jî ku ji 2005`an ve xwedîbingeh e, bi felsefeya tevgera azadiyê jin li derdora şoreşê kom kirin û azad kirin. Bi felsefeya Rêber Apo, jinan cihê xwe di nava şoreşê de girtin. Jinên li ser vê felsefeyê xwe bi rêxistin kirîn, îro bûne pêşeng."

Xaliya Necar got, li bakur û rojhilatê Sûriyê jin di tevayiya qadên jiyanê de bûye xwediya roleke girîng û bi van gotinan berdewamî da axaftina xwe: "Em tev dizanin ka jin berî şoreşê çawa dijiya û rola wê di civakê de bi çi rengî bû. Ji bo bidestxistina mafê xwe, berî şoreşê jî jinan heta asteke baş kar û xebat dikir. Lê şoreşa 19`ê Tîrmehê, ji bo jinan bû çavkaniya pêşxistinê. Weke niha li ber çavan tê xuyakirin ka jin, bi destpêkirina şoreşê gihîştiye çi astê. Mirov dikare bêje, jin bi felsefeya Rêber APO re, vejîn."

`Ji bo gelê bakur û rojhilatê Sûriyê 19`ê Tîrmehê derfeteke zêrîn e`

Xaliya Necar got, ji bo em li ser xaka xwe azad bijîn û Rêbertiya xwe ji nava çar dîwarên zindanê rizgar bikin, divê gel bi siyaseta dijmin neyê xapandin û li dîrokê vegere. Endama Rêveberiya Kongreya Star Xaliya Necar axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo gelê bakur û rojhilatê Sûriyê derfeteke zêrîn e. Ji bo wê pêwîstî bi xurtkirina berxwedanê heye. Bi taybetî divê jin li hemberî desthiladaran hêza xwe xurttir bike. Divê ji cîhanê tevê re bide xuyakirin ku, şoreşa bi navê wê hatî destpêkirin wê bi kar û xebata wê bi ser bikeve."

Xwezaya Kurdistanê di nava berxwedaneke mezin de ye

TÊKOŞÎN AXÎN

Çawa ku gerîlayên Kurdistanê di nava berxwedaneke mezin de ne, xwezaya Kurdistanê jî di nava êgir de li dijî qirkeran şerekî dîrokî dike. Lewma li Kurdistanê berxwedan tê wateya jiyanê.

Ev nêzîkê sê meh in êrîşên herî dijwar ji aliyê dewleta Tirk ve li ser çiyayên Kurdistanê û gelê Kurd tê meşandin. Beramberî van êrîşan gerîlayên HPG û YJA Starê li ber her kevir û zinarekî, di bin siya her dar û şikêrekî de şerekî navûdeng dimeşînin.

Êrîşên ku bi arteş, çete û teknîkên herî modern yê dewleta Tirk ve tên pêşxistin li hemberî îrade û baweriya gerîlayên azadiyê ketiye nav neçariyekê mezin. Ji ber vê yekê dewleta Tirk hêrsa xwe ji xweza, daristan ango ji her zindiyekî vê axê derdixe.

ji bo parastina vê xakê giyanên xwe feda dikin

Rêwîtiyên dirêj a gerîlayan bêrawestan berdewam dike. Her ku berbanga sibehî de tîrêjên rojê xwe dide vê axê, wê çaxê dibînin ku hemû xweşikbûnên vê gerdûnê li çiyayên Kurdistanê de xwe pêşî me dike. Bêguman bi keç û xortên xwe yên wêrek ve bedewiya çiyayên Kurdistanê zêdetir dibe. Bi qasî bedewbûna van çiyayan, xwedî xweşikbûn û dilekî wêrek e her gerîlayek. Çiya û rêwiyên ku di nav de dijîn, xwedî hêzeke wiha ne ku, her kesê ku lê temaşe dike, dibe heyrana wan. Gerîla; li ser her girekî, kevir û zinarên mezin de, qelîştokên kûr de şerekî mezin dide, ew deverên ku her kêlî dengê guleyan, teqemeniyan, bêhna gazên jehrî lê tê, bi mirovên ku her kêlî giyanên xwe feda dikin ve dibe qadê ku jiyan têda diafire.

Şopên Berxwedanê û Şerê Dîrokî

Dema ji şîvereyên ku şopên gerîla xuya dike de dimeşin, li ser her kevirekî de şopên guleyan, di her bihustekî de darên şewitî û xweliyên ku berbayê difûre dibînin. Wekî ku asîmanên şîn di vê kela germa havînê de êşên pir mezin dijî û dilê xwe parve dike bi rêwiyên xwe re. Dar û ajalên ku di hembêza vê xwezayê de xwe naskirin, parastin û hebûna xwe domandin cardin mirovên herî dilpak, jixwebawer di warê zayîna xwe de nas kirin. Ew jî keç û xortên gelê Kurd in, neviyên Şêx Seîdan, Seyîd Riza û Rindê Xan in. Çawa ku ji bo Rindê Xan, ax hebûn bû, rûmet

bû îro jî jinên Kurd di şopa Rindê Xanan de ji bo parastina nirxên xwe, axên xwe şerekî rûmetê dimeşînin. Di vê şerê de çiya û çalakvanên dil pola bi hev re dibin heval.

Li Navenda Dîroka Mirovahiyê Şerê Hebûnê

Dema ku gav bi gav şiverêyên dirêj derbas dikin ew xweliyên ku ji bermahiya agirê sotîner mayî dikeve heta hinavên mirov. Janeke dijwar di dil de çêdibe. Axên pîroz ku bûye çavkaniya pêşketina mirovahiyê û bihûşta li ser rûyê erdê, di nava agirekî dijwar de dişewite, pêtên wî bilind dibe. Kulîlkên bedew di nava vî agirê de bûn xwelî û tevlî bayên herikbar bûn, darên ku bi salan rehên xwe berdabûn nava axên welêt de bûn xwelî û çirûskê wan şewata dilê gerîlayan mezintir kir. Lewra li her bihustekî vê axê destan hatine nivîsandin. Di her barîna baranê de bêhna dîroka berxwedanê bilind dibe heta digihîje hemû cîhanê. Kenên çiyayî li ser her zinarekî de di bêhna her kulîlkekî de, di baskên teyrêbazan de, di hembêza van çiyayan de digere ango zindî ye. Ji ber vê ye ku dewleta Tirk û artêşa wî ne tenê li hember PKK'ê ango gerîlayên Kurdistanê şer dike, di rastiyê de pergaleke wiha ye ku dijminê her zindiyekî ye. Xweza, dar, av, ajal û hemû zindiyên vê axê ji ber ku şopa dîroka mirovahiyê ve tijiye, dibin hedefa êrişan

Gerîla û xwezaya Kurdistanê bi hev re soza tolhildanê dane

Çiyayên Kurdistanê, Zap, Metîna, Avaşîn, Besta û Licê her roj dişewite. Erd û ezman di nîva agir de ye Gerîlayên ku çiyayên bilind ji xwe re kirine wargeha jiyanê û azadiyê, di her şîvereyekê de careke din soza tolhildanê didin. Ev şerekî berxwedanê ye. Ne tenê gerîla, xwezaya Kurdistanê jî di nava berxwedaneke mezin de ye. Çem û rûbarên welêt, Avaşîn, Basya, Xabur, Dîcle pêl bi pêl coş dibe. Tîrêjên rojê her çi dibe bibe li hember zaliman careke din xwe digihîne dilê gerîlayan lewra ew ê tola vê axê ji dagirkeran bipirsin. Gelê Kurd her tim li dora agirê berxwedanê wek xelekekî bûne yek û xwe ji xweliya vî agirî ji nû ve afirandine. Çawa ku gerîlayên Kurdistanê di nava berxwedanê de ne, xwezaya Kurdistanê jî di nava agir de li hember qirkeran di nava şerekî dîrokî de ye. Ji ber vê yekê li Kurdistanê wateya jiyanê berxwedan e.

ANF

KCK: Êrişên qirkirina Kurdan bêbersiv namînin!

KCK'ê di daxuyaniya xwe de teqez kir ku berpirsên êrişên li dijî Kurdan AKP/MHP ne û got, yên ev êriş bi rêxistin kirîn û pêk anîn, teqez wê hesab ji wan bê pirsîn.

Navenda nûçeyan/Qamişlo

Piştî kuştina Deniz Poyraz li avayiya HDP'ê ya Îzmîrê, êrişên nijadperestan yên ser Kurdan her ku diçe pirtir dibin û kuştin û birîndarkirina mirovan dewam dikin. Berî çend rojan li Afyonê, komeke nijadperest bi awayekî organîzekirî êrişî malbatên Kurdan kirin û xwestin jin û mêrên Kurd lînç bikin. Di vê êrişê de işkence li mirovan hat kirin û hinek ji wan birîndar bûn. Berî cejnê li navenda Enqere jî bi heman awayî êrişî Kurdan kirin û gelek birîndar kirin ku rewşa dudukyan giran e. Herwiha li gundekî Konya, Hakim Dal ji aliyê bi dehan êrişkarên faşîst ve li ber çavê xizmên wî hat kuştin. Berş demeke kurt dîsa li Konya careke din êrişî malbateke Kurd kirin û hin ji wan bi giranî birîndar bûn. Derheqê van êrişên faşîstan de ku bi awayekî birêxistinkirî tên kirin, Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê daxuyanî da.

Di despêka daxuyaniya KCK'ê de ji malbata Hakim Dal re sersaxî û sabir, ji birîndaran re jî şîfa hat xwastin. Herwiha hat bîranin ku ji salên 1990î ve, li Tirkiyê êrişên nijadperestan yên ser Kurdan dest pê kirine û bênavber heta roja me ya îro dewam dikin.

'Ev êriş li hemberî kesên xwedîvîn û azadixwaz in'

KCK'ê di berdewamiya daxuyaniyê de wiha got: "li Tirkiyê êrişên nijadperestan yên ser Kurdan ji nişka ve zêde bûn. Diyar e ku ev êriş ne bi tesaduf in, bi zanebûn tên birêxistinkirin. Êrişên ser Kurdan yên li bajar û navçeyên Tirkiyê têkiliya wan bi polîtîkayên desthilatdariya faşîst ya AKP-MHP'ê re heye. Kurdên ku Kurdîtiyê diparêzin û daxwaziya azadiyê dikin, dijmin hatine ragihandin. HDP ku çareseriya demokratîk ya pirsgirêka Kurd diparêze, dijmin hatiye ragihandin û timî kirine hedef. " Daxuyaniya Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê wiha dewam kir: "Kesên dengê xwe didin HDP'ê, hêzên demokratik û gelên Tirkiyê yên azadixwaz gef li wan tê xwarin. Jixwe, dijminatiya PKKê û Rêber Apo jî, dijminatiya hebûna gelê Kurd e. Rêber Apo ji ber ku hişmendiya azadiyê daye gelê Kurd, di nava zext û tecrîdeke giran de tê girtin." Herwiha di daxuyaniyê de hat zanîn ku di şexsê malbatan û şexsan de êrişî tevayiya gelê Kurd tê kirin ku Kurde cesaret neke bêje 'Ez Kurd im' û îradeya jiyana demokratîk ya gelê Kurd bê şkandin.

Tifaqa AKP-MHP'ê fermana van êrişan bi fermî dide

Di berdewamiya daxuyaniyê KCKê bal kişand ser polîtikaya AKP-MHP'ê ya li dijî gelê Kurd û wiha domand: "Çi dema destplanên tepisandinê li ser Kurdan amade dike, bi rêxistin dike û fermana wê dide. MÎT û MHP ew hêz in ku van plansaziyên şerê taybet bi cih tînin. Ji ber wê piraniya kesên ku êrişî Kurdan dikin têkiliya wan bi MHP'ê re heye. Tayyîp Erdogan ji gelê Kurd û hêzên mûxalif re got, 'ev ji bo we hê demeke xweş e' û fermana êrişan da. Jixwe bi gotina 'Kurd ne xwecihî û milî ne' Kurd kirin hedefa her hilatdariya AKP-MHP'ê gefê li Kurdan, li HDP'ê û li hêzên demokrasiyê dixwe, hinek radibin vê ji bo xwe wek reman dibînin û dest bi êrişê dikin. Navendeke şerê taybet heye ku rengê êrişê."

'Bi van êrişan dixwazin di nava gelan de dijminayiyê çêkin'

Di daxuyaniyê de banga yêkîtiya gelan hat kirin û wiha dewam kir: "Komkujiyên di sala 2015'an de yên li Pirsûs û Gara Enqere jî ji bo pêşîgirtina li yekîtiya demokratîk ya gelan bû. Lewra li gorî mêtîngeriya qirker eger gelê Kurd û gelên Tirkiyê di têkoşîna demokratîkbûnê de werin bal hev, wê dawiya mêtîngeriyê bê. Ji ber wê dixwazin pêşiya pêkhatina vê yekîtiyê bigirin da hesabên xwe yên qirkirina Kurdan bi hêsanî pêk bînin. Divê li hemberî van êrişên qirkirinê, hêzên demokrasiya Tirkiyê, hevgirtin û îradeya têkoşîna hevpar ya bi Kurdan re xurt bikin û li dijî faşîzmê, bi têkoşina Kurdan re bin." Herwiha gelê Kurd li dijî van êrişên plankirî, hat şiyarkirin û hat gotin armanca van êrişan yek jê ew e ku Kurdên li Anatolya Navî ji ciyên wan derxin.

'Divê Kurd di warê xwe de stûyê xwe xwar nekin'

Di berdewamiya daxuyaniya Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê de, hat gotin, ev êriş li dijî hebûna Kurdan in û divê Kurd li hemberî van êrişan teqez hebûna xwe biparêzin. Herwiha xwe bi rêxistin bikin û daxuyanî wiha qediya: "Wêrekiya Kurdan dikare her êrişê bişkîne. Di vî warî de, divê stûyê xwe xwar nekin. Em dixwazin tevî gelên Tirkiyê li her derê bi biratî bijîn. Em dijminatiya ti gelî nakin. Lê dema êriş were kirin, emê jî bersivê bidin. Xwebirêxistinkirin hêza herî mezin ya parastinê ye. Li her navçe û bajarê Tirkiyê parastin bi xwebirêxistinkirin û berxwedana li hemberî êrişan pêkan e. Em bang li gelê Kurd dikin ku di rewşên wisa de hevgirtinê xurt bikin û ji bo bidawîanîna van êrişan têkoşîna azadî û demokrasiyê li her derê geş bikin."

Ji nêz ve

Destkeftiyên Rojava Biparêzin.

Ednan Mustafa

Piştî Peymana Syks-picot gelê Kurd li ser axa xwe û Kurdistan rastî parçebûnê hatin û ji aliyê çar dewletên dagirker ve hatin çewisandin. Polîtîkaya ku dagirkeriya tirkî li bakurê Kurdistanê li dijî Kurdan bi rê ve dibir, yekser dibû ezmûn ji bo rêjimên din; weke rêjima Îran, Iraq û Sûriyê.
Van welatên mijara gotinê bi sepandina polîtîkaya qirêj ya inkara Kurdan li parçeyên din yên Kurdistanê. Plana "Şerq Islah" ji aliyê dagirkeriya tirkî ve hatibû pêkanînin. Rêjima BEES li Iraqê jî bi hemleya Enfal, polîtîkeya valakirina gundan û komkujiya Helebce domand. Dîsa Rêjima BEES li Sûrî li ser pêşniyara Mehmed Teleb Hilal di sala 1962an de, pêşkistina polîtîkaya 'Kembera Erebî' li ser rojavayê Kurdistanê, ji berhema rihêm Plana Şerqî Islah bû. Bêguman her çiqas nakokî û pevçûn di navbera hêz û welatên digirkerên li ser Kurdistanê hebin jî, dema mijar dibe Kurd û Kurdistan nakokî û cudabûnên navbêra wan dikevin alî û li cihê wê hevkarî û parvekirina plan û projeyên tinekirin û qirkirina Kurdan dikeve dewrê. Mînaka herî berbiçav, dewleta tirkî û Rêjima Îranê ji serdema Sefewî û Selçûkiyan ve neyar û dijminên hev in, lê dema mafê Kurdan dikeve rojeva cîhanê her du rêjim inkara Kurdan dixin rojeva xwe. Dîsa di encama tecrûbeya Şoreşa Sûrî de, Tirkiyê ji %25 axa Sûrî û Rojava dagîr kiriye û bi milyarên dolaran çek û cebilxane dan komên çete ku rêjima Esed hilweşînin. Lê li gorî encamên civînên Soçî û Astana, herwiha hevkariya ewlekariyê di mavbera her du aliyan de, li ser bingehê tinekirina gelê Kurd li Rojava tê kirin. Ev nêzîkatiyên dagirkerên Kurdistanê hem di dîroka kevin û hem jî di roja me ya îro de wisa berdewam e.
Li hemberî van nêzîkatiyan inkar û polîtîkayên tinekirina Kurdan, yekane riya xilasiyê bi hevgirtina gelê Kurd ya navxweyî û bi yekkirina civakên li Kurdistanê bi hev re dijîn ve girêdayî ye. Ango modêla çarseriyê Xweseriya Demokratîk e. Xweseriya Demokratîk xwe dispêre felsefeya Neteweya Demokratîk ku bi hemû rihendên xwe dikare pêşî li siyaseta inkar û qirkirina neteweyan bigre. Di vê derbarê de pirsa sereke wiha ye: Çawa ku dagirkerên Kurdistanê li derdora pirojeya inkara me dibin yek, çima emê li derdora projeya xweseriya demokratîk nebin yek û xilasiya xwe tê de nebînin? Vegera vê pirsê û bersiva wê, bêguman ezmûn û tecrûbeya Şoreşa 19 Tîrmehê ya rojavayê Kurdistanê ye.
Bi vê boneyê, Şoreşa Rojava heşt sal li pey xwe hiştin û derbasî sala xwe ya nehan bû. Helbet ezmûn û tecrûbeya Şoreşa Rojava derxistiye holê, ne tenê neh sal, têra hezarên salan ya mirovayiyê dike. "Şoreşa Gelan" bi pêşengiya gelê Kurd û li ser bingehê Neteweya Demokratîk pêş ketî, dagirtî ye bi dersên ku civak ne tenê di warê siyasî, herwiha di warê leşkerî, aborî û ekolojîk civakbûna xwe bide sazkirin. Şoreşa ku li ser rehendên Neteweya Demokratîk pêş ketiye, her roja ku diçe dibe realîte û hebûna xwe diparêze. Rastiya vê yekê jî îro em li Rojava jiyan dikin. Gelên ku bi xwe hebûna xwe diparêzin û xwe ava dikin, heman gelê ku bi salan e li hemberî zilm û zordariya mêtîngeran li ber xwe daye.
Berxwedana ku li ser felsefeya Rêber Ocalan hatiye sazkirin, di serî de li hemberî inkar û pişt re jî li dijî faşîzma DAÎŞ û terora wê şer kir. Di vê weteyê de, berxwedana hatiye meşandin û pêşxistin yek ji rehendên sereke ya Netweya Demokratîk e. Di vê çarçoveyê de, Şoreşa Rojava destgirtin û parastin pêkan e. Derveyî vê yekê ne mûmkin e gelê Kurd û gelên herêmê bigihin azadiya xwe. Ji bo vê yekê em bi hev re careke din piştgiriyê bidin Şoreşa 19 Tîrmehê û ne tenê Statûya rojavayê Kurdistanê, vîn û hebûna civaka Kurd bi destxistî biparêzin.

Li deriyê Sêmalka danûstandina PDKê bi Kurdan re

Li deriyê sînor yê Sêmalka yê di navbera Rojava-Başûrê Kurdistanê de ku ji 2013'an û vir ve tim pirsgirek lê hene, vê carê jî bi tifaqa MÎT-PDK'ê hin planên din tên bicihanîn.

Li deriyê sînor yê Sêmalka yê di navbera Rojava-Başûrê Kurdistanê de ji 2013'an û vir ve tim pirsgirek hene. Li deriyê sînor ku tim tê girtin vê carê jî rêveberiya PDK'ê hin gavên din bi cih tîne.
Ev gav tifaqa PDK-dewleta tirkî destnîşan dike, ku ev gav piştî gefên dewleta tirkî yên li ser herêmê hatine avêtin.
Deriyê Sêmalka ku ji bo bakur-rojhilatê Sûriyê yek ji deriyên girîng e, li sînorê Başûr-Rojavayê Kurdistanê ye. Ev derî ku herwiha deriyê bazirganiyê ye jî, derman, pêdiviyên bijîşkiyê, xwerek jî jê derbas dibe.
Herwiha ji bo tedawiya nexweşên ji Rojava jî deriyê Sêmalka deriyê derbasbûnê ye. Ji ber vê jî pir girîng e. Di şerê li dijî DAIŞ'ê de yên ku birîndar dibin ji bo tedawî bibin diçin başûrê Kurdistanê.
Mirovên ku dixwazin ji Rojava derbasî Başûr bibin çi tê serê wan? Mirovên ku xebatên wan yên Deriyê Sînor yê Sêmalka qediyan, belgeyên wan pêşî dişinin rêveberiya Pêşxabûrê û tê payîn ku bersiv were dayîn. Piştî ku bersiv tê, tê xwestin ku biçin aliyê din yê sînor ango ji bo ku biçin Pêşxabûr diçin cem rayedaran û forman dadigirin.
Piştî form tên teslîmkirin kesên têkildar, pirsên ne di formê de dipirsin. Pişt re yek diçe odeyê. Li wir du kes bi dehan pirsan dipirsin. Dema ku bersiv neyê dayin jî yan heqerat li wan tê kirin û gef li wan tê xwarin ku careke din nikarin ji sînor derbas bibin. Tê texmînkirin ya ku rapirsînê dike Istîxbarat Tirkî (MÎT) e.
Herwiha bi kêfî bi saetan tên sekinandin. Ji hin mirovan re tê gotin forma ku hatiye dagirtin wê çend rojan were kontrolkirin û tê xwestin mirov vegerin û pişt re werin. Di formê de pirsên pir cuda hene. Navê bavê kalikê dê, navê kalikê hevserê mirov, navê eşîrê, koka etnîk adresa wan ya berê. Pirsên wiha weke xaçepirsê ji mirovan tên kirin.
Welatî dibêjin ji van nêzîkatiyan pir tengezar dibin lê ji bo ku mecbûr in derbas dibin û wiha dibêjin: ''Em jî Kurd in. Xwedêgiravî ew jî Kurd in. Çi tînin serê me, hişê me nagire. Çima wiha li me dikin. Bes e êdî. Tiştên ku li ti deverên cîhanê nabin tên serê me. Li welatên din vîzeyê jî naxwazin lê dema ku ji parçeyekî welatê xwe diçin parçeyê din çi tê serê me.''
Ciwan û jinên ku ji sînor derbas dibin ji nêzîkatiya rêveberiya PDK'ê pir aciz in. Ciwanekî ji Rojava ku ji Pêşxabûrê xwestiye derbasî Sêmalkê bibe, dibêjin, ji bo ku gotiye, 'heval', lê dane.
Yên ku ev nêzîkatiyên deryasayî yên PDK'ê dibînin van gavên PDK'ê şermezar dikin û dixwazin ev pirsgirêk demildest bên careserkirin.
Asteng dikin ku şervanên QSD, YPG, YPJ yên di şerê dijî DAÎŞ'ê de birîndar bûyîn biçin Başûr û tedawî bibin. Asayişa PDK'ê, kesên ku dixwazin derbas bibin asteng dike. Li başûrê Kurdistanê kesên ku alîkarî didin birîndaran jî, PDK gefê li wan dixwe.
Ji ber ku Deriyê Sînor yê Til Koçer girtî ye ambargo li ser bakur-rojhilatê Sûriyê heye û heke Deriyê Sînor yê Sêmalka jî were girtin wê zor û zehmetiyên mezintir derkevin pêşiya welatiyan. Rêveberiya Rojava piştî van nêzîkatiyan Hezîrana borî biryar li ser da ku derî bigire. Lê yên ku nedîtin ku rêveberiya Rojava vê qebûl nake û ji ber vê derî girtî ye bi gotina ,'Dixwzin deriyê Rojava bigirin' xwestin meselê bikin bara rêveberiya Rojava. Rayedarên Rojava jî dibêjin, em dixwazin gelê me bê ku rûmeta wan were şkandin bikare biçe û were.''
Rêveberiya Sêmalka sedema girtina deriyê sînor wiha vegotibû: 1-Rêwî mecbûr tên hiştin ku forma bi agahiyên istixbarî dagirin. Mirovên nû zewicîn, nexweş û jin 48 saetan li hêviya pejirandina başûrê Kurdistanê dimînin. Gelek rêwî mecbûr in ku bi lezgînî derbas bibin. Mînak nexweşên pençeşêrê li Başûr tedawiya wan nayê kirin. Herwiha kesên ku wê bizewicin ji ber ku wê serî li sefaretxaneyan bidin divê derbas bibin. Herwiha kesên ku wê ji Kobanê û Şehbayê bên sînor û derbas bibin heta ku karê wan were qedandin divê li Qamişlo bisekinin.
2-Rêwî bi saetan li deriyê sînor tên sekinandin. Lêpirsîna wan tê kirin.
3-Birîndarên ku ji bo tedawî bibin diçin Başûr nêzîkatiya dermirovî li wan tê kirin. Di pêvajoyên lêpirsîna istixbarî de derbas dibin.
4-Kesên ku derheqê xwe de formê li deriyê sînor yê Pêşxabûr danaynin nahêlin ku kes bi rengekî lezgînî derbas bibe.
ANHA

Rêveberiya Xweser bersiva hikumeta Şamê da

Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser bang li hikumeta Şamê kir ku zimanekî aqilane bi kar bîne û dev ji zimanê xiyanet û sûcdarkirinê berde.

Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, li ser malpera xwe ya fermî daxuyaniyek da raya gîştî. Daîreyê di daxuyaniyê de, bersiva idîayên hikumeta Şamê da û bal kişand ser helwesta hikumeta Şamê ya têkildarî aloziya Sûriyê û got, xwendina ne rast ji rewşa heyî re, aloziyê kûrtir dike."
Daîreyê di destpêka daxuyaniyê de got, weke her car, rejîma Sûriyê bi riya wezareta derve derdikeve holê û bi zimanekî dûrî mentiq û rastiya heyî diaxive. Ew jî zimanê dûrî rewşa heyî û hedefkirina Rêveberiya Xweser e."
Daîreyê wiha dewam kir: "Axaftina wezareta derve ya rejimê li ser projeya Rêveberiya Xweser ku dibêje wê Sûriyê lawaz bike, careke din hişmendiya rejîmê nîşan dide. Herwiha xwendina ne rast ya rewşa gîştî ya Sûriyê û girêdana xwe bi zihniyeta inkarkirin û paşguhkirinê û israra li ser projeya xwe ya navendî ku welat gihand asta tehlûkê, diyar dike."
Daîreyê da zanîn ku Rêveberiya Xweser projeyeke nîştimanî-sûrî ye. Wek Rêveberiya Xweser em diyar dikin ku emê projeya xwe ya nîştimanî ya sûrî bidomînin.
Daîreyê bang li hikumeta Şamê kir û got, em bang li rejîma Sûriyê dikin ku berjewendiyên nîştimanî yê Sûriyê li ber çavan bigire û Rêveberiya Xweser reş neke.
Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser careke din bang li hikumeta Şamê kir ku zimanê mentiq bi kar bîne. Herwiha beşdarî diyaloga cidî bibe û xwe ji zimanê xiyanet û tewanên ne rast, xelas bike.
ANHA

Salvegera 9'an ya Şoreşa 19'ê Tîrmehê

Ebûd Mexso

Şoreşa Rojava di 19' ê Tîrmeha sala 2012 an de, bi hêz û coş tîrêjên ronahiyê li ezmanê Kobanê ya berxwedêr belav kirin. Kîn û hesreta salan bûne volkaneke ji pêt û agir. Li ser meqamê mûm û çirayan ronî didan û ber bi daxweziya azadiyê ve diherikîn. Mîna bêhna gulavan difûriya û rojên reş û tarî hilweşandin.
Bi bîr û bawerî bû koka resen ya miletperwerî û tîrêja hêviyê di sedsaliya 21ê de deriyên hesin û zingarî şkandin. Bi hêz û saya berxwedana zindana di sala 1982yan de û pêngava 15ê tebaxê di sala 1984 an de ji bo nirxên mirovayiyê bûye çiraya hêviyên paşrojê. Rê û rêbaz, dergehên azadî û demokrasiyê û projeya biratiya gelan xemiland. Mîna bajarê Stalîngirada duduyan hat binavkirin û deng veda.
Ev şoreş bi wateya xwe ya rastî bû xwîna rehên tevayiya kesayet û saziyên civaka demokratîk û di binê sîwaneke zelal û aştiyane de kom kirin. Jinê bandoreke mezin bi têkoşîneke bêhempa û bi giyanê şoreşgerî, bi rêvebirî û cangorî xwe kir stûneke dîrokî. Ji bo tevayiya jinên cîhanê bûye nimûneyeke berbiçav. Ji ber wê ev şoreş bi navê şoreşa jinê hat mohrkirin. Heta ku projeya neteweya demokratîk pêk were, ji destpêkê ve bi rê û rêbazên biratiya gelan li bakur rojhilatê sûriyê hat ragihandin. Bi tevayiya pêkhateyên xwe yên Ereb, Kurd, Suryan, Tirkmen û...hwd, bû şoreşa neteweya demokratîk û qelenekî pir giran hat dayîn. Çima em dibêjin şoreşa jinê? Lewra cara yekê di dîrokê de jin pêşengiya şoreşê dike. Belê, jin bû kok û bingehê azadiyê û li dijî nêremejîyû ku ji hezarê salan ve desthilatdarî dikir. Herwiha ji bo azadî û wekhevîyê dengê xwe gihand tevayiya jinên cîhanê. Bêguman cihê şanazî û serbilindiyê ye. Lewra cara yekê ye li Rojhilata Navî û cihanê jin barekî wiha dide ser milê xwe. Ji ber wê xwedîderketina li vê xebata nirxdar ji tevayiya azadîxwaz û mirovperweran re erkekî pîroz e. Dema navê Kobaniyê tê bîra mirovan helbet berxwedana dîrokî ya leheng û qehremanên demê dibe tabloyeke berxwedanê li ber çav, dil û mejî.
Yek ji encamên vê şoreşê ragihandina Rêveberiya Xweser ya Demokratîk bû. Ku tevayiya pêkhateyan bi awayekî rêxistinkirî bi rê ve dibe. Lê dijmin û çeteyên wan, li hemberî şoreş û Rêvebiriya Xweser bi dijwarî şer kirin û bi tevayiya hovîtiya xwe êrîşî Kobanê kirin. Lê hêzên rûmetê (YPG-YPJ) bi vîn û baweriya xwe bersiveke dîrokî dan. Ne Kobanê tenê cîhan tev ji DAIŞa terorîst rizgar kirin. Mixabin hê jî pir dewletên ku behsa demokrasiyê û mafê mirovan dikin bêdeng in.
Di van mercan de pir kar û xebateke nirxdar û hatin kirin. Ev rêveberî bi saya şoreşa rojavayê Kurdistanê hat ragihandin û bû sîwaneke civakî. Herwiha di qada aborî, diplomasî, rêxistin, perwerde, leşkerî, olî, dadî...hwd. de bandoreke mezin kir.
Belê ev rêveberî bû jiyana giyan û dilê civakê. Mîna romaneke peyvzêrîn û her kesê azadîhez û mirovperwer bi coş, mereq û serbilindî dixwîne.
Ev şoreşê ket sala 9an û rojbiroj pêş ve diçe. Profesorê mezin Noam Çomskî got, ev şoreş perco ye– mûcîze ye. Ev jî bi saya şervanên rûmeta demê pêk hat ku jin di vê şoreşê de bû parêzvan û pêşeng. Ji ber wê parastina vê şoreşê erkeke mezin û lezgîne. Heta rûpelên dîroka mezin jî erkê xwe pêk bîne, divê tevayiya saziyên civaka sivîl û mirovayiyê vê şoreşê biparêzin. Di heman demê de divê her qad û kolanên jiyanê bibin xwediyên vê şoreşê. Li gorî parastina vê şoreşê xwe bi rêxistin bikin û tev bigerin.
Hingê wê dijmin têk biçe. Li ser vî bingehî wê bibe koka çareseriyê ji bo sûriyeke demokratîk û wê rengê hişmendiya seranserê Rojhilata Navî were guhertin. Bi giyanê şoreşa 19'ê Tîrmehê wê xelkên me Kurd, Ereb, Suryan...hwd. dagîrkeriyê têk bibin û serkeftinên dîrokî misoger bikin. Bîranîna şoreşa 19'ê Tîrmehê tê wateya bîranîna parastina nirxên mirovayiyê.